KURD YARÎZANÊN

Vedam Adem

Bêguman di van 15 salên borî de gelek av di bin piran re derbas bûye û nexasme li Îraqê û devera Rojhelata Navîn bi giştî, û yê li destpêkê hay ji van guhorînan hebe dê îro kar bê giringiya pêngavên ku têne avêtin bi helsengîne.

Piştî roxyana cemserê komonîst, welatên deverê, anku desheladarên wan welatan ketine berelayekê ji ber nehizirkirin û xweneamedekirin bo rojekê wekî wê rojê, ev jî nîşana sivikiya mejiyê siyasî yên siyasetmedarên wan welatan diyar dike, lewma jî ronahiya kesk bi şêweyekî ji şêweyan hate vekirin bo dîktatorê Îraqê Sedam Husên ku derbasî Kuwêtê bibe û rêkê ji bo hatina Emirîka bo deverê vebe, bi şêweyekî yasayî û rolê xwe di parastina berjiwendiyên xwe li deverê mîna hêza yekem û serkirdeya cemserê semyadariyê û yê serkevtî di şerê sar de û dest bi çinîna berhemê siyaset û xebata berhingariya xwe li beranber Yektiya Sovyetê ya helweşiyayî bike û her wesa şitlên nû li devera Rojhilata Navîn de biçîne wek derbirîn ji siyaseta wê û dîtina wê bo paşeroja deverê.

Welatek mîn Emerêka ku pitir ji 50 salan serkirdatiya bilokê semyadar, anku cîhana azad, di şerê berhingariya eydolojiya komonîst û dîktator dikir, welatekî ku xwedan destgehên stratîcîk û berdewam kar li her çar kenarên cîhanê dikir, ku welatekî xwedan nerîneke dûr e

ne bi tenê li dor paşeroja deverê, belku li ser astê cîhanê, îro çi pêngavên şaş na avêje dema leşkerê xwe dihinêre Efxanistan û Îraqê da ku kelhên ninûneyên tariyê û dîktatoriyê hilweşîne û şitlên demokrasiyê, bi xûna leşkerê xwe avde, çi pêngavên şaş na avêje demê fişarê didane li ser welatên mîna Lîbiya, Mîsir û Koriya bakûr û hoşdariyê dide her welatek yan kopaniyekê piştevaniya wan bike û demê rijdiyê li ser çareserkirina kêşeyên Yogislaviya û Teymora rojhilat û Sudan û Îraqê û Îranê û Turkiyê dike, çi pêngavên şaş navêje demê piştevaniya bihêzkirin a demokrasiyê li welatên Qefqasiya, anku yên têne niyasîn, bi komarên Sovyêtên berê mîna Ukraniya, Corciya, Uzbekistan, Qerxîziya, Azirbêcan.., çi pêngavên şaş na avêje demê rijdiyê li ser derxistina rijêm û leşkerên Sûriya ji Libnanê dike û hoşdariyê dide Sûriya û Îranê ku destên xwe ji deverê bikêşin û piştivaniya tîrorê nekin û li şûna wê arîşeyên welatên xwe çareser bikin û bi aşkere dibêje wan ku ew serdemê ku pê dixwerin çûye ava û dema îro ne dema hovîtî ye, belê dema diyalog, azadiya derbirînê, aştî, mafê mirov û dîmokrasiyê ye.

Çi pêngaên şaş navêje dema îro serokê mezintirîn hêza cîhanê pêşwazî li serokê herêma Kurdistanê dike û bi şêweyekî fermî danûstandina di gel dike û çu pûte bi nerazbûna dewletên dagîrkerên Kurdistanê neke, her dîsan amojgariyeke bo wan rijêm û dewletan ku îro giringtirîn yarîzan di qada Rojhilata Navîn de, yarîzanê kurd e û razîbûna wî mercê dabînkirina paşerojeke bi sûd û mifaye bo her xwedan berjewendî li